Nûçeyên Hackney Homes: Adar 2008

Ew çi roj bû!

Bêtir ji 1000 nîştecîhan roja 20ê Sibatê ji bo Roja Vekirî ya Hackney Homes herikîn the Ocean li Mare Street; dîyar bû ku nîştecîhên ji hemû jî (temen) û piştgehan hatibûn.

Ji bo nîştecîhan derfet hebû ku li ser Hackney Homes û xizmetên ku em pêşkêş dikin bêtir agahî bistînin, tev li çalakîyên kêfxweşîyê bibin, xwarinên bara 'çêja Hackney' tahm bikin û hema bi rojeke kêfa derve ya bêpere kêfxweş bibin.

Mirov bi taxeke kopî ya afirandî ketin heyecanê, li wir dikanîbûn hîn bibin ku çawa li malê bijûn û ewle bimînin, cîranekî baş tê çi wateyê, û dikanîbûn agahîya destê yekemîn û mînakan bistînin ku li malên xwe çawa sevzeyan biçînin.

"Ji bo dê û bav, zarok û malnişînan (teqawît) gelek tiştên hînbûnê hebûn. Ya ku herî pir bala min kişand qafikên sîr û pîvazan bû, ku ez plan dikim ku li malê li ber paceya xwe çandinîya wan bikim," wisa digot Simone, 29 salî, ji Hoxton. Li rûpelê çaran binêrin ku nîştecîhên din çi digotin.

Pîrozbahî ji bo Alicia Bartholomewa ji Stamford Hill, serketîya bi siûd a pêşbirka Pasaport. Ew Nintendo Wii'yekê dibe malê. Her weha, pîrozbahî ji bo Janice Joof ji Woodberry Down û Giovanni Todd-Barnes ji New Kingshold Estate ku bûne duyemîn û iPod Nano qezenc kirine.

Sipas ji bo her kesên ku hatin û beşdarî li ewqas serketîkirina rojê kirin!

BI KURTÎ NÛÇE

Li Bakurê Rojava Birêvebirekî nuh ê Ofîsê

Nîştecîhên li Bakurê Rojava (Stoke Newington) dikanin bipên ku di Adarê de li Ofîsa Taxa xwe rûyekî nuh bibînin. John Ferman, wek Birêvebirê Ofîsa Taxê tev li tîmê bûye. John bi xwe re dewlemendîyeke tecrubeya birêvebirîya xanî tîne.

Dersên Îngîlîzî astengan radikin

Bernameyeke bêpere ya perwerdeya Îngîlîzî ji alîyê Hackney Homes, UXL, Komela Xanî ya Bangla û Sazîya Avakarîya Londonê (LDA) ve tê piştgirtin, di 29ê Meha Yekê de li Landfield Estate li Bakurê Rojhilat bi awayekî fermî hat destpêkirin.

Serokê Hackney Homes, Rupert Tyson wisa şîrove kir ku fêrgeh dibin alîkar ku astengên li ber civaka Bangladeşî rabin û alîkarîya wan dikin ku kar bibînin. Rupert bi taybetî ji Komela Kirêdar û Nîştecîhan a Landfield Estate re ji bo hevkarîya wan sipas kir.

Meg Hillierê endamê parlamentê li gel nûnerên her sazîyeke hevkar tev li vekirinê bû. Ji bo bêtir agahîyê, bi Jackie Loftus re li 020 8356 7863 têkilî çêbikin.

Van rojan li rojnivîska xwe not bikin
Roja Bijartekên Xanî - 2 Nîsan

Roja Bijartekên Xanî çarşema 2ê Nîsanê ye, li the Ocean, Mare Street (li hemberî Town Hall) 12.00 – 18.00.

Hun dikanin hêvî bikin ku li ser bijartekên ku wek kirêdarekî şaredarîyê ji bo we peyde dibin agahîya berfireh bistînin. Heke hun difikirin ku malê bar bikin û ji we re hinek agahî pêwîst be, werin û bersîvên pirsên xwe bisitînin.

Di nav *Nûçeyên Hackney Homes* de…ji bo bêtir agahîyê, li belavoka bi vê Nûçenameyê re (tenê ji kirêdaran re tê şandin) binêrin.

Lampeke şikestî ya kuçê çawa rapor bikin

Heke hun li taxa xwe lampeke kuçê ya şikestî bibînin, bi Navenda Xizmetê ya Hackney re li 020 8356 2897 têkilî çêbikin. Xetên telefonê rojên heftê ji 8.00an heta 20.00an vekirî ne û rojên şemîyê jî 9.00-13.00.

Ji bo raporkirina lampe û mobîlyên kuçan ên xerabe û/an bi xeter, fener, pesare, an pêwengên din ên ronîkirî vê hejmarê bikar bînin.

Ciwanên herêmê di çalakîya hêşînkirinê de

Zarokên ji xwendegeha destpêkê ya St John of Jerusalem li Homerton vê nêzîkê tev li karmendên Lênêrîna Zemîn bûn ku li cîhekî vekirî makyajeke hêşîn çêbikin.

Xanîyên Sitargeh û Hackney Homes pev re fînans dikin û dê û bavên herêmê û Komela Mamosteyan piştgirîyê dikin, cîhê li Primrose Square Rd li Homerton nuha kesk û hêşîn dibe û cîhekî vekirî yê vexwendkar pêşkêşî civaka herêmî dike.

Ben Zimmermanê ji tîma projeyên taybetî ya Hackney Homes digot ku zarokên herêmê pir bi heyecan bûn ku bi qasî 1350 rehek û darên nuh biçînin, ku di nav wan de lawante, derzîlok û lehane hebûn.

“Hêja bû ku zarok tev li vê projeyê bûn û wan bi çavê xwe afirandin û lênêrîna cîhên hêşîn ên vekirî yên wek vê dîtin” Ben wisa digot.

Sonia Lamberta ji Komela Dê û Bav, Mamoste û Hevalên xwendegehê ji bo pev re xebitîna li ser vê projeyê sipasîya Hackney Homes kir.

Sonia wisa digot “Min xwest ku ez careke din sipasîyeke mezin a dê û bav û zarokên me bînim zimên. Guhertinên li Primrose Square guhertineke wisa pêk tînin ku gelek ji me bêtir bi hêvî û erênî bûne. Ji bo ku em li karê nuh binêrin çi ji destê me bê em ê bikin.”

Nişteçîh pesnê tesîsa germkirinê didin

Nişteçîhên Sîteyên Acton û Haggerston ji karê sazkirina germkirina navendî li malên wan ewqas xweş in ku vê yekê ji me re dinivîsin û dibêjin.

Gracelands, yek ji lixwegirên me yên germkirinê, ji bo Hackney Homes li gora projeya Malên Minasib karê germkirina navendî dike.

Xanim û Beg Perry ji Livermere Court gotin ku ji profesyonelîzma ku xebatkaran raber kiriye pir kêfxweş bûne. “Em dixwazin sipasîya endazyarên (muhedîs) ku li mala me xebitîne bikin. Pir alîkar, nazik, kibar bûn û di seranserê sazkirinê de agahî didan me.”

Her weha, Melanie ji Haggerston Road ji awayê profesyonel û bi bandor ku xebatkaran karê xwe kirine pir xweş bûn.

Gracelands her wisa tev li karê teftîşên paceyên sîteyan dibe ku ka li gora sazkarîyên gazê ne an na. Wan her weha ew kar sitendiye ku di domahîya karên Malên Minasib de hem teftîş û hem jî tamîra borîyên jorde herikînê bikin. Û ew her weha alîkarîya kirêdarên Hackney Homes dikin ku bêtir hêşînparêz bibin; di dema teftîşên xwe de ampûlên teserûfa enerjîyê didin wan.

Tev lê bibin

Roja Vekirî ya Nişteçîhan…we ji me re çi got

Hinek şîroveyên ku nişteçîhên (ji hemû jî û temenan) ku hatin standa Edîtorê Nûçenameya Hackney Homes a li herêma Tev lê Bibin li jêr in.

Dîsa sipas ji bo hemû tevlêbûyîyan.

“Ev bûyer çiqasî kêfxweşî ye. Ez şa me ku li vir im û xwişka min jî hez dike ku li vir e. Bi rastî jî kêfa min ji hemû çalakîyan hat, bi taybetî dîwarê grafîtî û standa çêja Hackney” Bose (8 salî), Frampton Park Estate

Ez ji vê çalakîyê hez dikim, ji ber ku min rûyê xwe daye boyaxkirin û balon û dîyarîyên din belav dikim” Aadam, Kingsmead Estate

“Hackney pir çêtir dibe. Ez li sîteya xwe, xwe ewletir his dikim. Êdî kûçikên bejî li sehayên Londonê tunin. Ev çalakî li gora min pir kêrhatî ye û tevlêbûna wê û dîtina rûbirû ya karmendên Hackney Homes *kêfxweşî ye”* Lorraine Ayres, St Mary’s Estate

“Birêz Hackney Homes, ev tiştekî hêja bû. Me pir kêf kir û gelek çalakî û tiştên kirinê hebûn. Me her wisa gelek xwarinên cîhêreng ceribandin” Savanagh (7 salî) û Sanchez (8 salî), Lockner Estate

“Tiştekî xweş bû ku min her kesekî ji civakê dît û li ser tiştên ku li navçeyê diqewimin nêrînên xwe gotin. Min hez kir ku endamên Desteya Birêvebir bibînim û bi mirovên cuda re bim” Valerie Bayson, Regents Estate

Pîroz be li serketîyê bi siûd!

Xanim Vitalisa ji Bakurê Rojhilat vê nêzîkê wek kibarîyeke Hackney Homes ji bo ku bûye cîraneke baş, kirêya xwe di demê de daye û şerd û mercên peymana kirêdarîya xwe bicîh anîne ji bo pêwengên metbexa xwe £500 xelat qezenc kiriye.

Xanim Vitalis yek ji şeş serketîyên bi siûd ên pişka xelatê ya Serbilindîya Cîh a sê mehane bû.

Pêşbirka ‘Serbilindîya Cîh’ li ser wê yekê ye ku kirêdarên ku kirêya xwe didin, li mal û sîteya xwe dinêrin û cîranên xwe hemet dikin, tên xelatkirin.

Xanim Vitalis kêfxweş bû ku ji nav bi hezaran kirêdarên ku li gora peymana kirêdarîya xwe tev gerîyane bi korfelaqî hat hilbijartin. “Ez ji hevalên xwe re qala qezenckirina xwe ya bi siûd dikim û ew nikanin bawer bikin. Ez çiqasî şa me. Ev 35 sal in ku min tiştek qezenc nekiriye,” Xanim Vitalis wisa digot.

Serketîyên duyemîn bi £100an fîşên kirînê sitendin. Ji bo bêtir agahîyê, telefon bikin bo 020 8356 5053 an jî biçin www.hackneyhomes.org.uk

Li hawirdora komelên kirêdar û nîştecîhan (KKN)

KKNa Lea View House we vedixwîne bo paqijîya biharî

KKNa Lea View House bi piştgirtina Karmendê Tevlêbûna Nîştecîh (KTN) roja şemîya 15ê Adarê di navbera 13.00 û 16.00an de li Hola Civakî ya sîteyê ‘firotina dezgeha holê’ pêk tîne.

Çima paqijîya biharî zû nedin destpêkirin û xwe ji tiştên li mala we ku êdî nayên bikaranîn rizgar nekin? An jî werin û bibînin ku çi tên firotin –hatina her kesî kêfxweşî ye! Tev li kêfê bibin, hinek tiştên erzan bikirin û cîranên xwe bibînin.

Kirêkirina maseyeke mezin £8 û ya piçûk jî £5 e. Ji bo veqetandina maseyekê, li gel Jennifer Jones, Karmenda Tevlêbûna Nîştecîh li 020 8356 2117 têkilî çêbikin. KKN ê wê rojê xwirek û vexwirekên sivik bifiroşe.

Di Roja Navnetewî ya Joseph Court de pîrozkirina çand û Paskalyayê

KKNa Joseph Court a li Bakurê Rojhilat bi piştgirtina Karmendê Tevlêbûna Nişтecîhê xwe roja Şemîya 22ê Adarê di 14.00-16.00an de Rojeke Kêfxweşîya Paskalya plan dike ku gelek çand û netewên cîhêreng ên nişтecîhan pîroz bike.

Hun ê di Roja Kêfxweşîyê de alayên ji alîyê nişтecîhan çêkirî ku dişibin çandên cuda yên li sîteyê bibînin û mirov tên teşwîkkirin ku xwarinan bipêjin û xwarinên pişтgehên xwe yên kevneşopî bi xwe re bînin. Nişтecîhên tevlêbûyî yê bi gotina çîrokên xwe û her weha boyaxkirina rû û çêkirina nepoxan şahîyê pêşkêş bikin. Ji bo bêtir agahîyê li gel Jennifer Jones, Karmenda Tevlêbûna Nişтecîh li 020 8356 2117 têkilî çêbikin.

Heke hun li ser avakirin an tevlêbûna KKN a herêma xwe agahîyê dixwazin, ji kerema xwe têkilî çêbikin li gel tîma Tevlêbûna Nişтecîh li 020 8356 7845.

Koma fokusê ya Stamford Hill

Endamên panela jêr-komîteya Stamford Hill vê nêzîkê komeke fokusê birêk xistine ku li ser sê mijarên sereke rawestin; komunîkasyon, xizmeta tamîrê û birêvebirîya sîteyan.

Rupert Tysonê Serokê Hackney Homes û Serok Birêvebir Susmita Noonan li gel birêvebirîya bilind a Hackney Homes û birêvebirê peymana taxê Pinnacle tev li bûyera bi serkêşîya nişтecîhan bûn.

Muriel Gordon MBE, Serokê Panela Stamford Hill , got ku roj di heqê qadên xizmetê yên taybetî ku pêwîstî bi çêtirkirinê hebûn û di van qadan de bersîvkirina fikarên nişтecîhan de bû.

Hêsankerekî serbixwe gotûbêjeke kûr li ser mijarên ku hem karmend û hem jî nişтecîh di her mijarê de rûbirû dibin, birêve bir.

“Parvekirina nêrînan ji rêzeyek temîyan derketin ku karmend ê ji bo çêtirkirina xizmetan lêpirsîna wan bikin,” Muriel wisa digot.

Ev temî û encam ê di çalakîyeke piştî wê ya di mehên havînî de bên gotûbêj kirin.

Nûçeyên Xwedî-Lease û Xwedî-Milkan

Nûçe bi kurtî

Lêkolîna Fona Îhtîyatî

Pirsnameyên fona îhtîyatî di Çileyê Pêşîn de ji hemû xwedî-lease’an re hatin şandin û dewra şêwirdarîyê ji bo dawîya Sibatê hat dirêjkirin. Em nuha dîtîyên pirsnameyan analîz dikin û em ê meha bê wan ji we re rapor bikin.

Pêşçavkirina Birêvebirîyê ya Karên Sereke

Em nuha bihayê birêvebirîya karên sereke pêş çav dikin. Di nav biha de mesrefên ku Hackney Homes li şêwirdarî, fatore kirin û baş kirina karên sereke dike, hene.

Me metoda biha sitendina xwe ya nuha daye ber ya desthilatîyên herêmî yên din û ALMOyan, da ku pratîka herî baş bibînin û nuha em di pavajoya nirxandina gelek metodên cîhêreng ên biha sitendinê de ne. Em ê ji hemû xwedî-lease û xwedî-milkan re binivîsin ku we ji van bijartekan haydar bikin, da ku hun bikanibin bijarteka tercîha xwe hilbijêrin. Tê plankirin ku bijarteka tercîhkirî dê di dawîya vê sala fînansê de bê bicîhkirin.

Bihayên Texmînî yên Xizmetê yên 2008/2009an

Ev nuha tên amadekirin û wê berî dawîya Adarê bên weşandin.

Konferansa Xwedî-lease û Xwedî-milkan … şûnve agahîdana we

Konferansa Yekemîn Car a Xwedî-lease û Xwedî-milkan di 26.01.2008an de hat lidarxistin û 160 xwedî-lease û xwedî-milk tev lê bûn.

Çalakîyê derfet da xwedî-lease û xwedî-milkan ku karmendên Hackney Homes bibînin û bi wan re li ser xizmetên ku distînin bipeyivin.

Hackney Homes li konferansê baş hat temsîlkirin; gelek karmendan bi dilxwazî dema xwe dan ku temîyan li xwedî-lease'an bikin.

Şûnve agahîdana xwedî-lease û xwedî-milkan dîyar dike ku gelekan çalakî pir kêrhatî û ji payina wan çêtir dîtiye. Ew bi kêfxweşî bi karmendên Hackney Homes re peyivîn, ku awayên nuh ên tevlêbûnê bibînin û her weha li ser mijarên wek dayina bihayên xizmetê, karên sereke, paqijî û şêlên antîsosyal fikarên xwe bibêjin.

Pîrozbahî li Ruth Boyce, Fred Filce, Mohammed Uddin, Denise Bingham û Ron Devoti – serketîyên bi siûd ên pêşbirkê – wan her yekî bi £100an fîşên xwarinê birin malê ku her Ofîseke Taxê bexişandibû.

Tê hêvîkirin ku Konferans êdî her sal bê lidarxistin.

Pirs û Bersîvên Konferansê

Hemû pirsên ku li Konferansê hatin kirin ji alîyê navendê ve hatin qeydkirin û em bersîva xwedî-lease û xwedî-milkên ku yek bi yek pirs kirine didin. Li gel vê yekê, me pêwengeke agahîyê ya Pirsên Pircar saz kiriye ku li www.hackneyhomes.org.uk peyde dibe.

Heke hun nikanin Înternetê bikar bînin, ji kerema xwe li gel Tîma Xizmeta Mişterî li 020 8356 2100 têkilî çêbikin û ew ê ji we re bê postekirin.

Li jêr mînakeke pirsên bi bersîv ku wê rojê hatin kirin heye.

Pirs û Bersîv

P: Sîstemên kamerayên CCTV pircar xerabe ne –Hackney Homes ji bo ku hemû pereyê razandî bêtir bikêr bîne çi dike?

B: Sîstemên CCTV heftane tên kontrolkirin û kamerayên nexebitî di nav 2-5 rojan de tên tamîrkirin, li gora şêweyê tamîrê diguhere. Xizmetên Milk planeke 5 salane ya çêtirkirina sermaye ji bo guherandin û çêtirkirina sîstemên CCTV heye ku bicîhkirina teknolojîya nuh jî di nav de ye. Ji 1 Nîsan 2008an û pey ve navenda CCTV ê ji bo armancên lênêrîn û çavdêrîyê bikanibe xwe bigihîne %98ê sîstemên CCTV ên sîteyan. Xwe gîhandina van sîsteman bi rêya bicîhanîna sîstemeke torevanîyê ya Bêtêlî ya WiFi ji bo Hackney Homes mumkun bibe, bicîhkirina sîstema WiFi wê bihêle ku kamerayên ku cîhên wan tên guherandin bên bicîhkirin, da ku bi pirsgirêkên wek avêtina tiştan mijûl bibe.

P: Hackney Homes bi pîsîya kûçikan û dengzarîyê çawa mijûl dibe?

B: Tîma Bicîhkirinê ya Navçeya Hackney a Londonê li ser navê Hackney Homes li dijî nişteçîhên ku dihêlin kûçikên wan li sîteyên Hackney Homes pîsîya xwe bikin tev digere, bi şerdê ku delîl têrê bikin, wek mînak fotograf an îfadeya nivîskî ya kesekî ku amade ye derkeve pêş

Wê pêwîst be ku hun tarîx û dem û cîhan, hwd bidin. Heke ji we re bêtir agahî pêwîst be, ji kerema xwe li gel Eucharia Mbonu li 020 8356 4501 têkilî çêbikin.

Hinek qaydeyên zêrîn ku ji bo deyndar nebûne ji we re bibin alîkar …

- **Pirsgirêkê pişgtuh nekin**: bi xwe ber naçe û hun çiqasî bihêlin, ewqas xerab dibe.

- **Bêyî ku bi baldarî bifikirîn, ji bo paqijkirina deynan peran deyn nekin**. Berê bişêwirin. Bi vî awayî pere deyn kirin dikane bibe sedem ku mala we ji destê we here.

- **Heke karê we ji destê we çûbe, an hun ji ber nexweşîyê ji kar derketibin**, binêrin ku dayinên we ji alîyê sîgorteya parastina dayinan parastî ye an na. Li peymana kredîya xwe binêrin.

- **Binêrin ku hun hemû alîkarîyên sosyalê û Kredîyên Bacê yên mafê xwe disitînin an na**.

- **Yekser bi xwedîyê deynên xwe re têkilî çêbikin û dijwarîyên xwe jê re îzeh bikin**. Herin û wan bibînin, an jî ji wan re telefon bikin an binivîsin.

- **Berê bi deynên xwedî pêşanî mijûl bibin** – wek mînak, deynên ku dikanin bibin sedema ji dest çûyina xanîyê we an birîna gaz an elektrîka we.

- **Bi her kesê ku hun deyndarê wan in re têkilî çêbikin**. Heke hun ji bo dayina hinek xwedî deynan sazkarîyan bikin û ji hinan jî re nekin, dibe ku dîsa jî dijwarîyên we çêbibin.

- **Heke mirovê ku hun pê re dipeyivin nebe alîkar**, bixwazin ku bi kesekî paye bilindtir re bipeyivin, dibe ku ew bikanibin tiştên ku hun dixwazin bipejirînin.

- **Heke xwedîyên deynan zehmetîyan çêbikin jî, ji bo lihevkirinekê hewldana xwe bidomînin**.

Ji bo bêtir agahîya li ser şêwirdarîya pere – ji mijûlbûna bi deynên xerab heta plankirina budçeya we – li vir binêrin www.nationaldebtline.co.uk

Tevgera li dijî emlaqfiroşan

Şaredarîya Hackney ji bo dozlêvekirina emlaqfiroşên hîlebaz ku herêman bi depên reklamê yên neqanûnî xerab dikin serkêşîyê dike. Şaredarîyê nuha bi serketinî li dijî sê şirîkeyan doz vekirine, wan giştan ceza giran a peran sitend, ji ber ku lewhayên firotin û kirêdayinê bê destûr li dervê xanîyan dixistin.

Endamê Encumanê Alan Laing, Endamê Kabînetê ji bo Taxan wisa digot: “Plasterkirina cadeyan bi lewhayên firotin û kirêdayinê ku ji bo kirina vê yekê tu talîmat tunebin, bê guman sûcekî krîmînal e û dê xweş neyê dîtin. Em hêvîdar in ku ev dozlêvekirin ê dawî li depên emlaqfiroşan ên bê destûr bîne.”

Emlaqfiroş Keatons £19,200 ceza peran xwar û biryar hat dayin ku ji bo mesrefê bê talîmatên xwedîyan, çikandina pênc lewhayên firotinê û çarên kirêdayinê li heft cadeyên Hackney £1,573an bide. Û Robert Alan Homes £7,500 ceza peran xwar û biryar hat dayin ku ji bo mesrefan £2,000an bide.

We zanîbû?

We zanîbû ku hemû nişteclhên Hackney Homes ampûlên xwe bi yên teserûfa enerjîyê guherandine, ev ê ewqas enerjî bide teserûfkirin ku fatoreyên gaz û elektrîka 250 malan bide? Çima ji ofîsa xwe ya taxê ampûleke teserûfa enerjîyê hilnagirin? Bêtir agahî li vir peyde dibe www.hackneyhomes.org.uk